## Navnivîsandin ji bo kapasîteyeke wergirtina çavdêriyê li Hemşîretî û Miqatebûna Rojane ji Zarokan (Kindertagespflege) bi rêya TPF-ONLINE

TPF-ONLINE

Eger dixwazî zarokê xwe di Hemşîretî û Çavdêriya Rojane ji Zarokan tomar bikî, di vê rewşê da ast û her wiha çavdêriya caverêkirî ragihîne û dataya xwe hilgire. Ji bilî vêya divê Daxuyaniya Parastina Datayan were pejirandin.

Ji bo ku bikarî ragihandina hewcetiyê temam bikî, tu yê piştî wê Email'eke piştrastkirinê pêkhatî ji lînkeke çalakkirinê wergirî ku divê wê di heyama 72 saetan da piştrast bikî.

Li bajar û navçeyên têkildar li cihî Çavdêrên Rojane yên Zarokan (Rêveberên Binkeyê) hene ku li ser hemşîretî û çavdêriya rojane ji zarokan her wiha Çavdêrên Rojane ji Zarokan ên çalak li cihê te zanyariyan raber dikin. Tu dikarî rêveberên binkeya her yek ji cihan tevî hejmara telefonê li malpera navçeya Viersen'ê li adresa **www.kreis-viersen.de/kindertagesbetreuung** bibînî.

Di rewşa daxwazê da digel çavdêrên rojane ji zarokan li cihê xwe têkilî dayîne, demên hevdîtinê hevaheng bike û biryar bide ku zarokê te divê li cem kîjan çavdêrê rojane ji zarokan were çavdêrîkirin.

Eger te kesekî çavdêrê rojane ji zarokan peyda kiriye, dikarî vî kesî di ragihandina hewcetiya xwe di beşa şiroveyan da destnîşan bikî yan şêwirîna pisporî ya têkildarî xwe bi rêya Email'ê haydar bikî. Eger te zzarokê xwe bi rêya TPF'ê li Kita-Online (Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan a Serhêl) tomar kiriye, wê çaxê ji şêwirîna pisporî ya xwe belgeyên daxwazê û demeke hevdîtinê ji bo gotûbêjeke kesane werdigirî.

**Tu dikarî zanyariyên zêdetir li Portala serhêl a „Guter Start Kreis Viersen“ (Destpêka baş a Navçeya Viersen'ê) li vir bibînî: guterstart.kreis-viersen.de**

## Têkilî

Xebata Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan (KiTa) ya Navçeya Viersen'ê bi meyl û meraqa tam bi rêya vê hejmara telefonê şêwirînê raber dike:

**02162 39-1677**

Yan bi rêya Email'a bi adresa:

**kita-online@kreis-viersen.de**

Helbet tu dikarî bersiva bo Pirsên Pirrpar di beşa taybet da (FAQ) li rûpela destpêkê ya Kita-Online'ê bibînî.

**Ji bo wergeran ji kerema xwe Koda QR sken bike.**


KREIS VIERSEN

Jugendamt
Rathausmarkt 3 | 41747 Viersen
www.kreis-viersen.de

Herausgeber: Kreis Viersen - Der Landrat
Druck: Druckzentrum Kreis Viersen
Stand: Mai 2024
Fotos: ©www.clipdealer.com #A8404252


KREIS VIERSEN

JUGENDAMT



# KITA-ONLINE

## Portala têkildarî navnivîsandina li Navendên Miqatebûna Rojane ji Zarokan an Hemşîretî û Çavdêriya Rojane ji Zarokan

## Portal

### KITA-ONLINE çi ye?

Bi rêya Portala KITA-ONLINE tu dikarî zarokê xwe ji bo kapasîteyeke wergirtinê li Navendeke Miqatebûna Rojane ji Zarokan yan Hemşîretî û Çavdêriya Rojane ji Zarokan li navçeyên Brüggen, Grefrath, Niederkrüchten, Schwalmtal û Tönisvorst'ê tomar bikî.

### Ji bo vê mebestê hewcetiya min bi çi tiştî heye?

Te ji bo destragihîştina bo Înternetê, bi rêya Komputera Kesane (PC), Jîrefon an Tabletê pêwîst e. Eger destragihîştina te bo Înternetê tineye an pirsgirêka te di girêdana Înternetê da heye, sserdana Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan (KiTas) a têkildarî xwe li cihî yan Kadroya Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan bike (serdana beşa têkilîdanînê bike).

### Portal çawa kar dike?

Bi rêya malpera navçeya xwe yan malpera Înternetê ya Navçeya Viersen'ê serdana Lînka têkildarî Portala KITA-ONLINE bike.

Gemeinde
KINDERTAGESBETREUUNG

Bedarfsmeldung für einen Kinderbetreuungsplatz

in einer Kindertageseinrichtung ›››   in der Kindertagespflege ›››

Li vê portalê te ev derfet heye ku di navbera ragihandina hewcetiyê ji bo kapasîteyeke wergirtinê ya çavdêriya ji zarokan li Navendeke Miqatebûna Rojane ji Zarokan yan Li Hemşîretî û Çavdêriya ji Zarokan bibijêrî.

Di dewamê da her du rêgehên tomarkirinê dihêne şirovekirin.

## Navnivîsandin ji bo Kapasîteyeke wergirtina çavdêriyê li Navendeke Miqatebûna Rojane ji Zarokan bi rêya KITA-ONLINE'ê

KITA-ONLINE

Bi rêya lêgerîna hawîrdorê navendên miqatebûna rojane ji zarokan ên ku şert û mercên te dabîn dikin, bibijêre. Li beşa hûrgiliyên têkildarî her yek ji Navendên Miqatebûna Rojane ji Zarokan zanyariyên zêdetir bi dest bixe. Tu dikarî **heta herî pirr sê navenda bi rêzê li gorî meyl û eleqeyê** hevrê digel **destpêk û qasa çavdêriya çaverêkirî** (35 yan 45 saetan di hefteytê da) ragihînî). Piştra dataya xwe hildigirî û daxuyaniya parastina datayan dipejirînî. Ji bo dagirtina ragihandina hewcetiyê piştî wê tu yê Email'eke piştrastkirinê digel lînkeke çalakkirinê werbigirî ku divê wê di heyama 72 saetan da erê bikî.

i

### Heta kengî divê ez hewcetiya xwe ragihînim?

Ji bo sala têkildar a Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan – Kapasîteya wergirtina çavdêriyê di 1ê tebaxê da – divê te ragihandina hewcetiya xwe heta roja 14ê Mijdarê ya sala pêştir li KITA-ONLINE'ê tomar kiribe. Tu dikarî di heyameke wiha dirêj da ragihandina hewcetiya xwe biguherînî. Hertim ji 15ê Mijdarê heta 14ê Çileyê beriya destpêkirina sala Baxçeyê Zarokan ê zarokê xwe, tu nikarî babetên tomarkirî li Portala KITA-ONLINE biguherînî. Ji 15ê Çilleyê va dikarî dîsan li vê portalê tomar bikî da ku bibînî ku gelo te bersiveke erênî ji bo kapasîteya wergirtinê ya Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan wergirtiye yan na.

### Kengî ez bersivê werdigirim?

Rêveberiya Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan ku ji bo wê te bersiveke erênî wertgirtiye, piştî wê dê digel te têkilî dayîne. Der bareyê zarokên ku heta wê demê bersiveke erênî ji bo kapasîteya wergirtinê ya Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan bo wan nehatiye dayîn, di heyama mayî heta Adarê kiryarên navcîtiyê yên zêdetir li Navenda Miqatebûna Rojane ya Zarokan dê bi cih werin. Eger heta dawiya meha Nîsanê (Avrêl) hîn jî te bersiveke erênî wernegirtibe, Rêveberiya Ciwanan a Navçeyê (Kreisjugendamt) dê pêwendî çê bike.

### Ez çawa zanyariyên xwe yên nivîsandî biguherînim?

Tevahiya guherînên zanyariyên te yên kesane heta wê demê ji bo guhertina Navendên Çavdêriya Rojane ji Zarokan ên têkildar piştî pêkanîna tomarkirina seretayî pêkan in. Bi tomarkirina seretayî tu yê daneyên destragihîştinê ji bo têketina dêbavan bo nav sîstemê wergirî. Li Portalê bi rêya sembol û nîşaneyan derbasî nav beşa Tomarkirinê/Navnivîsandinê dibî. Li vir di heyama 48 saetan piştî wergirtina daneyên destragihîştinê, adresa Email'a bikarhatî di dema tomarkirinê da û Şîfreya/Têperpeyva xwe ya demkî dinivîsînî. Piştî ku ji te hat xwestin ku şîfreyeke nû û hertimî ji bo xwe çê bikî, dikarî tevahiya zanyariyên tomarkirinê bibînî û wan biguherînî û her wiha zarokên din tomar bikî û rewşa tomarkirinên têkildar bişopînî.

### Giring:

### Danasîna kesane ya berê bo navendên ku tu çaverê dikî jî hema wisa pêwîst e!

Ji ber vêya digel Rêveberan demeke hevdîtinê ji bo nasyarbûnê hevaheng bike. Kapasîteyên wergirtinê yên Navenda Miqatebûna Rojane ji Zarokan ji aliyê Navendên Miqatebûna Rojane ji Zarokan bixwe va bi rêya pîverên wergirtinê yên têkildarî wan bi xwe dihêne terxankirin. Ragihandina hewcetiya kesane ji bo kapasîteyeke wergirtinê ya Çavdêriya li navenda têkildar nîne.